

PARADOK'S¹ A DÎROKÊ – ÇAWA AGAHÎYÊN DI DERBARÊ SÊLAVA CÎHANÎ DA BEROVAJÎ KIRINE!

(Çend têbînî li ser r'ûpelên lêgênda² di derbarê Sêlava cîhanî û Nuh p'êxember da)

Ezîz ê Cewo Mamoyan

Şaristanîya cîhanê gelek efsane, legend, destaneyên gelêrî û ç'îrokên nebînayî û bêhemp'a dizane. Gelek ji wana wek peykerên hêja û bi nirx ên çanda r'ewanî ya mirovahîyê hatine p'ejirandin. Mirovan di demên cuda da helwestên cuda û cihêr'eng li hember wan dane xuyan, di derbarê wan da lêger'în pêk anîne û hewl dane, r'astîya wan a wat'eyî têbigihîjin, lewra ku dizanibûne, ku di wan da di derbarê paşer'oja wan a dîrokî da agahîyên r'astîn veşartî ne. Lêger'înên zanistî di vî warî da bi dewranan domyane. Û îro jî zannîyar di derbarê wan şahaserên çanda pêşîyan a r'ewanî ya dewlemend da lêger'înan pêk tînin, û hewl didin, bi r'êya wan r'astîyan bûyerên dîrokî yê cihêr'eng ên paşer'oja dîroka mirovahîyê têbigihîjin.

Yek ji peykerên vî r'engî esfaneya di derbarê Sêlava cîhanî û keştîya Nuh p'êxember da ye...



“K'êştîya Nuh”. – Wêneger Êdward Hik's, s. 1864.

gelên cîhanê da heye, di wê derbarê da govenîyê dide, ku ew ne bûyereke cîhanî bûye. Ku di demên cuda da di herêmên cuda yê Cîhanê da k'arasatên xwezayê yê ciyawaz pêk hatine, av r'abûne û sêlavan r'ûdane;

– heya îro îzbatî û delîlên zanistî nînin, ku bi r'astî di dîrokê da sêlavek a cîhanî pêk hatye;

– ne pêkan e, ku mirov bikiribe bi wê k'êştîyê, ya ku Nuh “avakiribûye”, li ser r'ûyê avê r'êwîtyê pêk bîne;

– wek ku di Încîlê da tê gotin, malbatek a ji 8 kesan bi xwe r'a jimareke p'ir' mezin a jînber û ajalên cihêr'eng li k'êştîyê bar kirye, û 40 rojî li ser r'ûyê avê mane. Pirs dertê hole: “Çawa? ... Ma pêkan e, ku malbateke ji 8 kesan bikaribûya demeke ewqas dirêj wan jînber û ajalên xwedî bike û hemû pêdivîyên wan pêk bîne? ...”

Pirs in, pirs in, pirs!

Lêbelê jixwe lêgend ji bo wê lêgend in, ku mirov nikaribin wisa bi hêsane bersîva pirsên

¹ Paradok's – ecêbî, tiştê xerîb ê dûrî heş û sewdayê mirov.

² Lêgênd – ç'îrok, efsane.

r'ûdayî bibînin!

– Bîranînên di derbarê sêlava cîhanî da t'enê di Încîlê da nînin, ew wisa jî di Quranê û r'êzek ç'avkanîyên dinê yên olî da hene. Û ew bûyerana di hinek herêmên cînarên hev da pêk hatine, ne ku di hemû p'arzemînên cîhanê da.

– Bîranîna di derbarê Sêlava cîhanî da di çanda gelên xristîyan, misulman û gelên Rojhilata Navîn bi giştî da heye, lê ew li bal hindîyên Mayya û At'stêkan da nîne. Li bal berekên (eşîr) dinê yên Bakûr û Başûrê Amêrikayê jî hîç bîranînek di derbarê sêlaveke wê pîvanê (masştabê) da nîne. Lê di çand û olên aborîgênên (binecî) Awistralîyaê da hîç agahîyek jî di vê derbarê da t'uneye.

– Her çiqas bi kevneşopî ç'îroka di derbarê Sêlava cîhanî da wek efsaneya încîlî tê hejmartin, lêbelê di derbarê wê bûyerê da cara yekem hê di ç'avkanîyên sûmerîyan da agahî hebûne...

Dyardeyeke balk'êş: her çiqas zerdeştî di nava gelên heman herêman da belav bûye, li k'u îro efsaneya di derbarê Nuh p'êxember û Sêlava cîhanî da serwer e, lê di çanda zerdeştîyê da di derbarê kataklîzm û bobelatên xwezayî da efsaneyek a dinê heye, û di wê da jî, li şûna Nuh p'êxember Yîma bi erk'a r'izgarkirina mirovan r'adibe.

Weha, di Avêstayê da tê gotin, ku "... dema Xwedê (Ahûra Mazda) di xaka Aryanam-Vayca ya bi nav û deng da, li r'ex ç'emê Vaxvî Daîtî civînek pêk anî, gote Yîma, ku zivistanê li ser cîhanê da bîn, dê serma mirinê hebe. Ku dê ewrên berfê bîn xarê, piştr'a ewê bihelin û avê r'abe... Ew dibeje Yîma, ku ew Varekê ava bike, ... avê bikişîne wir, li wira mêrg û çîmanên hertim hêşîn bigihîne, ... xanîyan û tewle-p'angeyan ji bo ajalan ava bike... Yîma hema wisa jî dike, ew ji axa kaxç'inî Varê avadike, ya ku ji sê aqarên gulover (xelekan) pêk dihat: di aqara yekem da Yîma neh dergeyan dihêle: di ya navîn da – şeş, di ya hindurîn da – sê dergeyan. Ew di bin dengê bilûra ji strûyê zêr'in saz kirî da mêr û jinan berf hindurê Varê dide û derê wê bi "derî-p'encereya ku ji hindurva r'onahî dida" digire, ew cîha wisa jî bi r'onahîyeke ne bi dest sêwirandî, bi r'omahîyeke ji hêla yekî nedîyar va "afirandî" va dihat r'onîkirin"³. Û tê gotin, ku Yîma bi wî awahî mirovahî r'izgar kirye.

Di derbarê sazîya Varê da û di derbarê êtîmolojîya p'eyva 'var' bi xwe da lêgerînera r'ûs Anna Ûspênskaya hembrahevkirinên balk'êş tîne (parall). Weha, ew çî dinivîse: "... sazûmanîya Varê, ya ku ji her'îya kaxç'inî hatye avakirin û ji sê xelekên hevnavendî (*concentric/kontsêntrîk*) pêk tê, mirov tima dihêle – ew p'ir' mîna wargehên *arîyên* kevnar e, yên ku li bakûrê Afxanistanê û li berp'alên başûrê Ûralê hatine dîtin. Wisa jî di devokên zimanê r'ûsî da p'eyvên "var" («вар») û "varok" («варок») ên bi wat'eya "hewşa ajalan" (axil) r'astî mirov tîn..."⁴

Li vira tiştêkî dinê yê balkêş jî ew e, ku îro jî di zimanê k'urdî da hemwat'eya p'eyva 'var' wek 'war' û şewazê hevtêk'el ê 'wargeh', ê ku ji wê pêk hatye, hene, û di jîyana r'oJane da bi wat'eya *cî-miskenê kal û bavan, xak (a pêşîyan), gund, cîyê lê êwirînê, êwirgeh*, bi berfirehî tîn k'aranîn.

Û tiştêkî dine yê balk'êş jî! Di Avêstayê da Ahûra Mazda bi van gotinan berbir'î Yîma dibe: "*O Yîma, lawê hêja yî Vîvaxvanta!*". – Dibe ku mirov dijwar bikaribe di gelek zimanên cîhanê yên dinê da gotineke bi vî şewazî bibîne. Lê di civaka k'urdî da îro jî, dema berbir'î mirovekî konkrêt dibin, şewazê bangkirinê yê weha tê k'aranîn, bi t'aybet jî, eger bav ê wî mirovî, an dêya wî kesayetek a r'êzdar e û di civakê da tê nasîn. Mînak, "Serdar, lawê Silêmin, tu ser ç'avan r'a hatî!". Wisa jî bala xwe bidin van şewazan: "Evdalê Zeynikê", "Qasimê lawê Meyro", "Filît ê Quto"... Ev ji k'u tîn? – Dibe ku xwendevan bibêjin – ê, dibe,

³ Авеста. Избранные гимны. Из Видевдата. Перевод с авестийского Ивана Стеблина-Каменского. Москва – 1993 г., стр.: 178 – 180. //Avêsta. Gatên bijarte. Ji Vîdvêdatê. Werger'a ji Avêstayê ya *Îvan Stêblîn-Kamênskîy*. Moskova – s. 1993. Bi r'ûsî, rû.: 178 – 180. – <https://klex.ru/wnj>

⁴ Анна Успенская, Зороастризм за 90 минут. Санкт-Петербург – 2006 г.// *Anna Ûspênskaya*, Zerdeştî di 90 deqeyan da. P'irtûk bi r'ûsî ye. R'û.: 56 – 59, an jî li vira: <https://religion.wikireading.ru/56804>

mînahevîyek e, îjar? – Lêbelê her tişt ne wisa sade û yektêgîn e. Eger mirov pirsê di goveka (çarç’ove) wan agahîyên dîrokî da binirxîne, yên ku didin zanîn, ku zerdeştî, wek ol û bawerî, di Medyayê da pêk hatye û pêşk’etye, û, bi xwezayî, Zerdeşt bi xwe jî *med* bûye, bi zimanê *medî* axivye û nivîsye, û k’urd jî peyhatîyên medan ên r’astedêr in, wê demê her tişt dê di cîyê xwe da bê danîn.⁵

Û – ji bilî vê! Bila lêgênd wek lêgênd di cîyê xwe da bimîne, lêbelê, her çi jî hebe, di bingeha her lêgêndekê da bûyereke dîrokî (berfireh, an ne ewqas!) an bîranîna di derbarê wê da heye. Lewra jî, wek ku hîç pêwîst nake, mirov hemû bûyeran li dû hev r’ed bike, her weha, nabe, ku wana biguhêr’e, an jî wat’eya wan berovaa jî bike.

Weha, ji dewr û zemanan tê zanîn, ku di ç’avkanîyê Încîlê bi xwe da hatye nivîsîn: “*Û keştî meha hevtan, r’oja huvdeyan a mehê li ser çîyayên Araratê r’awestyayê*”⁶, lê dîsa jî hinek lêger’îner û weşanger li ser ya xwe da k’etine û bi bir’yar diinivîsin, xwedêgiravî, k’eştîya Nuh p’êxember li ser çîyayê Araratê (Masîs/Agrî) r’awestyaye. Û heya hinek fotowêneyan jî diweşînin, ên ku (dîsa xwedêgiravî!) ji balafir’an k’işandine...

Lêbelê di dema xwe da nivîsk’ar û lêger’înerên cuda bal k’işandine ser wan berovajîkirinan û bi ç’avkanîyên Încîlê r’a t’evayî, wisa jî yên dinê anîne.

Yek ji wan nivîsk’aran jî lêger’înerê alman ê sedasala XVIII Îohann Haynrîx Drîmêl e. Ewî dîtina xwe ya di derbarê Sêlava cîhanî da di p’irtûka xwe ya bi sernavê: “Serpêhatîya danasînen dîrokî di wê derbarê da, ku r’ûsîyayî ji araratîyan pêk hatine, yên ku pey Sêlava cîhanî r’a gelê yekem bûne”.

Di destpêka p’irtûka xwe da Drîmêl dinivîse, ku, dema mirov serpêhatîyên ku nayên govtûgokirin ên P’irtûka Pîroz bixwîne, bê guman dê li bal wî nêr’înek derê, ku Nuh pêşîyê hemû gelan e, yên ku piştî Sêlava Cîhanî li hev zêde bûne, ku welatê Araratê, yê ku k’eştîya Nuh lê r’awestyaye, û Nuh û lawên wî r’izgar kirine, divê wek cîyê yekem ê ku wana nigê xwe lê danye, bê p’erestî. Lewra ku Mûsa vedibêje: “*Û ke’ştî li ser çîyayên Araratê r’awestyayê*”.⁷ – Ev jî tê wê wat’eyê, ku nişteciyên van deveran araratî bûne. – Ew gotina xwe li ser hevdu da tîne.

Û ji vê û pêva, ji bo ku îzbat bike, k’a di pêvajoya dîrokî da navê welatê Araratê çawa hatye guhar’tin, Drîmêl şirovedike, ku bi giştî wisa dibe, ku guhar’tina navê gelên binecî û welatên wan dibe tişteki pêkan, û, wek îzbatîya vê yekê, ew mînaka guhar’tina navê xakên almanan tîne (di destpêkê da xaka almanan di destê kêltan da bû, paşê an wek Gêrmanîya, an Alêmanîya, an Frasiya hate navkirin) û dibêje, heman tişt di dema xwe da bi navê araratîyan û xaka Araratê r’a pêk hatye. ... Ku her t’enê di Nivîsa Pîroz da serpêhatîya di derbarê wan bûyeran da hatye p’arastin, ên ku piştî Sêlavê di Cîhana me da pêk hatine. Û ku di wê derbarê da ne ku t’enê Mûsa p’êxember, lê wisa jî p’êxemberên dinê vedibêjin, ên wek: *Îsayîya, Yêrêmîya û afrandarê p’irtûkên p’adişahîyan* (mabesta wî *k’eşîş Yêzdra* ye, yê ku di nava îslamê da bi navê *Ûzayr* tê zanîn – E. C.).

Û, dema di derbarê vê pirsê da nêr’înen cuda dinirxîne, Drîmêl r’avedike, ku hê berî bûyîna Îsa navê Araratê bi zimanê cihûdan ê Temîya Kevn (The Old Testament) wek קרדו (Kardo. – E. C.) hatye nivîsîn, ku werger’a vê p’eyvê bi zimanê xaldêyî (keldanî) heye, û ew hêjayî her r’êzgirtinê ye, lewra ku ew wat’eya vê p’eyvê zelal û r’ast dide zanîn, ku gelên r’ojhilatî wê wek *kard, kord, kûrd* bilêvdikin, lê yewnanî –wek *kord, gord*, û ji van jî ev

⁵ Di vê derbarê da – bi hûrbîni di vê p’irtûkê da: *Ezîz ê Cewo*, Zerdeşt p’êxember (Rûpelên dîroka “windabûyî” ...), Ankara – s. 2018., rû.: 89 – 97; pdf a pirtûkê li vir e: https://www.academia.edu/38211603/ZERDEŞT_PÊXEMBER_RÛPELÊN_DÎROKA_WINDABÛYÎ

⁶ Бытие 8:4; также: в толкованиях на Бытие 8:4: от Иоанна Златоуста, от Кирилла Александрийского, от Филарета (Дроздова) и др. // Bûyîn 8:4; wisa jî: di şiroveyên Bûyîn 8:4 da: yên ji Îohan ê Zarzêr’în, ji Kîrîl ê Alêk’sandrî (Îskenderî), ji Fîlarêt û yên dinê. Hemû bi r’ûsî ye – <https://bible.by/fater/1/8/4/>

⁷ Моисей, кн. I, гл. VIII, стр.: 4./Mûsa, p’irtûka I, beşê VIII, r’ûpelê 4.

navên hanê pêk hatine: *Kardû, Kordanîya, Kûrdam, Kûrdîstan, Kordakên, Kardûxên, Kordîlîa, Kordîêa*.

Ev hemû p'eyvana jî heman xakê û heman gelî didin zanîn, ê ku hîç dagerkereki nikaribûye ji welatê wî yê kal û bavên – ji K'urdistanê derîne...

Piştî vê Drîmêl dinivîse, ku, wek ku agahîyên wî li jorê anîne, îzbat dikin, ku keştîya Nuh pêxember li K'urdistanê r'awestyaye, ew wisa jî îzbat dikin, ku k'urd gelê yekem ê piştî Sêlava cîhanî bûne...⁸

Berhema duyem, a ku di derbarê Sêlava cîhanî da di wê da agahîyên balk'êş hene, ew p'irtûka “Hevbiratîya T'orosan” a M. Mînasyan e, ya ku sala 1923-an di bajarê Frêznoyê (DYA) da bi zimanê ermenî hatye weşandin.⁹

Berî wê, ku evê p'irtûka balk'êş bi giştî bi xwendevanan bidim nasîn, ezê navbereke biç'ûk bidimê û bidim zanîn, k'a sernavê “Hevbiratîya T'orosan” tê çî wat'eyê. Divê di sêrî da bê gotin, ku di bingeha vê sernavê da navê Ç'îyar'êza T'orosan heye. Gelên cuda bi şewazên cuda ev ç'îyar'êza navkirine: r'ûsan: *Тавр (хребет)*, an jî – *Таврские горы*, kurdan: *Ç'îysayên T'orosan*, farsan: *کوه های توروس*, tirkan: *Toros Dağları*, yewnanîyên kevnar: *Ορη Ταύρου*, ermenîyan: *Տավրոսի լեռնաշղթա*, ereban: *جبال طوروس* ...

Çîyayên Torosan li ser erdê K'omara T'irkîyayê ya îroyîn li seranserê beravên Derîya Sipî, wek kevanekê sînorên t'or'a bilindîyên Asya biç'ûk û Ermenistanê dyar dike. Anegorî Ênt'sîklopêdîya Brîtanîyayê, xalên here dawîyê yên vê t'ora ç'îyayî li r'ojava gola Egîrdîr e, li rojhilatê şaxên jorîn ên ç'emê Firat in (Bakûrê K'urdistanê), lê anegorî ênt'sîklopêdîya r'ûsî ya “Erdnîgarî” (êdîtor A. P. Gorkîn) — Derya Êgê û ç'emê Zab ê mezin (Bakûrê K'urdistanê). Dirêjahîya vê t'orê – ji 1500-î heya 1600 km e, berayîya wê digihîje 200 km-an.¹⁰

Naha em vege'rin ser p'irtûka M. Mînasyan bi xwe.

Ji bo serdema xwe Mînasyan gaveke wêrekî avîtye, dema di p'irtûka xwe (ya “Hevbiratîya T'orosan”) da şewazdîtînen (aspêkt) cuda yên jîyan û çanda gelên vê herêma ç'îyayî nirxandye. Wek ku tê xuyan, ew bi xwe jî evê yekê têdigihîje, dibeku lewra jî beşê yekem ê p'irtûkê wek “Sembola wêrekîyê” nav kirye.

Nivîsk'ar di wan demên bobelatî (trajîk) da di nava xwe da wêrekîyê dibîne, ku di derbarê hevbiratîya gelan da, di derbarê xwep'arastina berekan (eşîran) da, di derbarê xweparastina dijî êrîş û dagerkerîya t'uranî da, di derbarê pêdivîya avakirina piiştbenda (kember) ewlek'arîyê da, di derbarê avakirina dewletên hevp'ar ên gelên R'ojhilata Navîn da (fêdêratsîon?! – E. C.) û ya here sereke – di derbarê hevbiratîya gelên p'ir' zêryayî yên herêma T'orosan da.

Helbet, ji M. Mînasyan r'a li hev nehatye, ji bo hemû pirsan bersîvên bi zanistî misoger bibîne, lê ew, ya ku wî di dema xwe da nivîsye, îro jî dikare bibe alîk'ar, ku mirov bikaribe bersîva pirsên di derbarê wan pêvajoyên civakî-siyasî da bibîne, yên ku di herêmê da û li dora wê îro jî pêk tên. Ew ji bo dîtîna û aspêktên cuda yên nirxandina pirsên ku demên cuda r'ûdidin, ç'avkanîyek a bi nirx e. Helbet, li wir hinek pirs û kont'sept jî hene, û di derbarê wan da mirov dikaribû bi nivîsk'ar r'a gengeşî pêkbanya... Hemma, ew babeta axavtineke dinê ye. Ê wê demê jî mirov dikaribû li ser bingeha dahûrîna (analîz) r'exneyî bersîva gelek

⁸ Bi hûrbîni di vê p'irtûkê da: *Иоганн Генрих Дримель*, «Опыт исторического доказательства о происхождение россиян от араратцев, как от первого народа после Всемирного потопа». Санкт-Петербург–1785 г., стр.: 5 – 25 // *Íohann Haynrîx Drîmêl*, “Serpêhatîya danasînen dîrokî di wê derbarê da, ku r'ûsîyayî ji araratîyan pêk hatine, yên ku gelê yekem bûne pey Sêlava cîhanî r'a”. Sankt-Pêtêrbûrg – s. 1785., r'û.: 5 – 25.

⁹ *U. Uşîmîsîyan*, «Տավրոսեան եղբայրակցութիւնը». Ֆրէզնո – 1923 թ. // *M. Mînasyan*, “Hevbiratîya T'orosan”. Frêzno – s. 1923.

¹⁰ Di vê derbarê da hûn dikarin li vir bixwînin: [https://ru.wikipedia.org/wiki/Тавр_\(хребет\)#География](https://ru.wikipedia.org/wiki/Тавр_(хребет)#География), an li vir: https://en.wikipedia.org/wiki/Taurus_Mountains û li vir: <https://dic.academic.ru/dic.nsf/ruwiki/1149701>

pirsên *dîrokî*, *çandî û civakî-siyasî* bidîta...!

Lê emê îro t'enê li ser wê r'awestin, a ku di vê p'irtûkê da di derbarê Sêlava cîhanî û Nuh p'êxember da hatye nivîsîn. Û emê heya di derbarê helwest û şiroveyên cuda yên nivîsk'ar da jî neaxivin, lewra ku ew nak'ave nava goveka pirsên vê gotarê.

Weha, Mînasyan p'irtûka xwe ya “Hevbiratîya T'orosan” bi vegotina di wê derbarê da destpê dike, ku ji bajarî Bet'lisê berbi başûr-r'ojhilat va ç'îyayek heye (Cûdî), û ji demên kevnar û vir va hersal 14-ê r'ezberê ji herêmên cînar nûnerên gelên binecî berv dibin – dost û neyar, ji bo ku bi hev r'a ji bo Yekê Jorîn (Xwedê) gorîyan (qurbanan) bidin.

Ew dinivîse, ku ç'îyayê Cûdî t'extê gorîdayînê yê gel e, û ew r'oj jî wek r'oja “Gorîdayîna Nuh p'êxember” tê hejmartin, lewra ku p'êxember wê r'ojê, piştî Sêlavê gorîdayîna xwe yekem ji bo Xwedê pêk anye. Dema pêkanîna merasîma gorîdayînê hem k'urd, hem xristîyanên ji mezhebên cuda û yehûdî... amade dibin.

Gelo, di t'evahîya cîhanê da pêşandanek a dinê ya ji vê bi bandortir, ji vê bi sur' û sêrtir heye, ya ku bi ewqasî bi bîranên lehengî va dewlemend be, ku hersal li van zozanan û li ç'îyayê wan ê pîroz, ê ku di dilê K'urdistanê da berê xwe daye asmîn û bilind bûye, pêk tê. Hersal ji her t'erefên K'urdistanê zyaretvanî (hecî) tên vira: yên nestûrî, xaldêyî (keldanî), yaqûbî, k'urdên sunnî, şîî, êzd ... tên, ku li ber cîyê pîroz tya bibin – serê xwe biç'emînin... Van r'ojan k'omên ç'ekdar ên dijminên hev bi hev r'a dora sivreyekê r'ûdinîn, bi hev r'a hêsa dibin, bi hevr'a li ber pîrozîyên xwe tya dibin û drozgê dixwînin, bi hevr'a wek birayên hev gorîdayîna xwe ji bo Xwedê pêk tînin.

Bi r'astî jî, eger di cîhanê da cîyek û demek heye, dema pêşdîtina p'êxemberî dibe r'astî, û gur û berx bi hev r'a dijîn, ew ç'îyayê Cûdî ye van r'ojên meha r'ezberê. Li vira diz, cerdevan û maxdûrên wan, heqaretk'ar û yên ku heqaret li wan hatye kirin, yên ku bi agir û şûr êrîş pêkanîne û ew, yên ku ew êrîş li wan hatye kirin, hemû bi aştîyane û wek bira dijîn. Ew çî hêz e, ya ku hemû nişteciyên kevnar ên K'urdistanê di cîyekî da û di bin banekî da berev dike? – Helbet, ew lêgênda gelêrî ye!

Hemû binecîyên kevnar ên Kurdistanê û Navç'emkê (Mêsopotamîyayê) bawer dikirin, ku k'eştîya Nuh p'êxember li ser vî ç'îyayî r'awestyaye. Nivîsa Pîroz jî Ç'îyarêza K'urdistanê destnîşan dike, dema dibêje, ku k'eştî li ser ç'îyayên Araratan r'awestyaye. Û di ç'avkanîyên xaldêyîyan (keldanîyan) û asorîyan da jî wî ç'îyayî wek cîyê pêkhatina bûyerê destnîşan dikin...

Û, ji bo ku gotina xwe piştrast bike, Mînasyan li xwe mukur' tê, ku ewî serpêhatîya di derbarê “Gorîdayîna Nuh p'êxember” a li berp'ala ç'îyayê Cûdî da cara yekem di p'irtûka “Dergehên Asyayê” ya zanîyarê amêrîkî Worfîld da xwendye, yê ku di Hîmalayan û Alpan da ataşê bûye. Mînasyan dinivîse, ku Worfîld ji serpêhatîyên di derbarê bûyerên ku li bilindcîya ç'îyayên K'urdistanê pêk hatine bawer kirye, û, ji bo ku di wê da t'am bi bawer be, ewî r'ewîtîyek pêk anye û bi xwe zyartevanîya li berp'ala ç'îyayê Cûdî dîtye, û nivîsye, ku her t'enê ermenî wî ç'îyayî Ararat nav dikin, yê ku ji milê başûr va li binat'ara Yêrêvanê ye, û bawer dikin, ku k'eştîya Nuh p'êxember li ser wî ç'îyayî r'awestyaye.

Di wan p'irtûkan da, yên ku li ber destê min hebûn, min nikaribû di wê derbarê da hîç tiştêkî jî ji bo xwe zelal bikira.– Û paşê ew didomîne: – Lêbelê demekê berê min di p'irtûka Lêo ya “Dîroka Ermenîstanê” da îzbatîya di wê derbarê da dît, ku welatê me Ararata kevnar û ç'îyayê Araratê di nava K'urdistanê da ne, û li vira gotinên wî bi xwe tînim:

“Profêsor K'êrovbê Patkanyan jimêjva îzbat kirye, ku navê Ararat van demên dawîyê danîne ser ç'îyayê Masîs, ê ku li besta ç'emê Arak'sê ye (Erez). Û, ku ew welat, ê ku gelên samî, bi t'aybet jî, Încîlê, Ararat navkirine, li derdorên derya Wanê bûye. Bi nêr'îna profêsor Gêlt'sêr, heya sedsala XI an X ev cîguhartinan nava nîkaribûyê pêk bê, ango, ew her weke hezar salî berê pêk hatye. Di “Dîrok” a Pavstos Byûzand da êdî zelal tê gotin, ku di welatê Kordan (Kurdistanê) da warê Ararat hebûye û li wira jî – Ç'îyayê Ararat, ku li ser vî ç'îyayî jî k'eştîya Nuh r'awestyaye. Ew heman ç'îyayê Ararat e, yê ku di lêgêndên zarkî da wek cîyê r'awestana k'eştîya Nuh P'êxember tê bîranîn, û Mûsayê Xorênî (Movsês Xorênat'sî)

jî ew berev kiribûne. Û di P'irtûka Afirandinê da jî di wê derbarê da tê gotin, ku ç'îyayê Araratê, yê ku di herêma Kordan da ye, di dîroka Sêlavê da tê bîranîn...".¹¹

Li şûna paşgotinê:

Li vira mirov dikaribû çî bigota?

Dibe ku – hîç tiştekî jî! Lewra ku, her tişt hatye gotin!

Lêbelê, dîsa jî, hêja bû, ku di dawîyê da bihata r'agîhandin:

– Wek ku tê xuyan, r'ehên vê berhemê diçin-digihîjin k'ûrahîya hezarsalan, û ew ji berê ber da wek afrandinek a gewre pêk hatye, ji bo çî pêwîst bû, ku naver'oka wê ya destpêkî berovajî bikin û r'astîya wê lêgêndê bi xwe t'ewş bikin?

Lê, wek ku tê xuyan, ji talebextan r'a, bi r'astî jî, carana di *dîrokê*, *wêjeyê* û *hunerê* da, wek şaxên zanistê, bêhtir siyaset heye, ne ku zanist...

Çî dikarî bikî, jîyan wisan e!

Lêbelê, divê mirov bêhêvî nebe, em vê yekê ji dîwana xwendevan r'a bihêlin!

E. C.

Pyatîgorsk/R'ûsîya – Hezîrana sala 2024.

Binenimûneya gotarê bi r'ûsî hatibûye weşandin.

Ç'avkanî: https://www.academia.edu/120880818/ПАРАДОКС_ИСТОРИИ_КАК_ИСКАЖАЛИ_ПРЕДСТАВЛЕНИЕ_О_ВСЕМИРНОМ_ПОТОПЕ_

¹¹ U. Ughisutkân, «Տարրուեան եղբայրակցութիւնը»: Ֆրէզնօ – 1923 թ., էջ 3 – 5.// M. Mînasyan, “Hevbiratîya T'orosan”. Frêzno – s. 1923., r'û.: 3 – 5.